



Die Senatorin für Kinder und Bildung · Rembertiring 8-12 · 28195 Bremen

Ji bo
Dêûbavan ango lînêrên qanûnî yên zarokan

Auskunft erteilt
Helena Justa

Zimmer 411

Tel. 0421 361-12604

Fax 0421 496-12604

E-Mail:
helena.justa@
kinder.bremen.de

Mein Zeichen
(bitte bei Antwort angeben)
30-1

Bremen, 16..11.2021

Stî û mîrzayên rêzdar,
dêûbav ango lînêrên qanûnî yên hêja,

ji Hezîrana 2021an ve hêlînên zarokan di asta bingehîn a plana astên bertekan de ye „lînêrîna zarokan a danê rojê ya li gorî şertên pandemiyê“. Ev tê wê wateyê, ku hûn û zarokên we tenê rastî hin astengiyên li hêlînan tên.

Di heman demî de hejmara enfeksiyonên mirovên derzîlixwenedayî bi dijarî zêde dibe. Her çiqas li ba zarokên li hêlînên Bremenê niha kêmfeksiyon hebin jî, **testkirina bi rêkûpêk a zarok û xebatkaran gelek girîng e.**

Bi riya testkirina dem bi dem em dikarin bi awayekî lezgîn hay ji enfeksiyonên pêkan hebin û pêşî lê bigirin, ku bi awayekî dorfireh li hêlînan belav bibin.

Senatora ji bo Zarokan ji bo her zarokî/ê û ji bo her xebatkarî/ê hefteyê du testên-zû pêşkêş dike. Divê zarok bêyî ku testa xwe bikin, newin hêlînê. **Ji kerema xwe re hefteyê du caran testeke zû ya zarokê/a xwe çêkin** û gava encama testê pozîtîv be, hingê zarokê/a xwe neynin hêlînê.

Ez dizanim, ku testkirin, bi taybet a zarokan, hinek zehmet e. Lê belê ev yek gelek girîng e, da ku zarok bikaribin bi awayekî ewle û pêbawer herin hêlînê.

Li hinek hêlînên zarokan di hefteyên pêş de carinan lolî-test dê ji bo tevahiya komên hêlîna zarokan ji aliyê karmend an jî xebatkarên pedagojîk ve were kirin, ku perwerdehiya tîbbî dîtine. Ez ji we rica dikim, ku hûn qebûl bikin, ku zarokê/a we beşdarî vê testkirina zarokan a bi dilxwazî bibe.

Li gel silavên germ
Peywirdar

Thomas Jablonski
- Rêvebirê Beşê -